

ULUSLARARASI
DENGBÊJLİK
KÜLTÜRÜ VE
DENGBÊJLER
SEMPOZYUM BİLDİRİLERİ



Sırnak Üniversitesi Yayınları
No: 23

Uluslararası Dengbêjlik Kùltürü ve Dengbêjler

(Uluslararası Sempozyum Bildirileri)

ISBN

978-605-80962-3-3

Genel Yayın Koordinatörü
Prof. Dr. Mehmet Emin ERKAN

Editörler

Doç. Dr. İbrahim BAZ
Dr. Öğr. Üyesi Ruhullah ÖZ
Dr. Öğr. Üyesi Çağdaş ERTAŞ
Arş. Gör. İsmet TUNÇ

İç Düzen ve Kapak Tasarımı
Mustafa AKBAŞ

Matbaa Sertifika No: 44676

Birinci Baskı
Ekim 2019
Şırnak

Baskı-Cilt
Mardin Sesi Gazetecilik Matbaacılık
Yayıncılık Amb. Dağ. San. ve Tic. Ltd. Şti
www.mardinsesi.com.tr

Copyright© Şırnak Üniversitesi Yayınları
Yeni Mahalle Cizre Caddesi
Mehmet Emin Acar Kampüsü 73000 ŞIRNAK
Tel : +90 486 216 82 41- web : www.sirnak.edu.tr

Tebliğilerin içerikleri ile ilgili sorumluluk
yazarlara aittir.



ULUSLARARASI
DENGBÊJLİK
KÜLTÜRÜ VE
DENGBÊJLER
SEMPOZYUMU

19-20 NİSAN 2019

ULUSLARARASI
DENGBÛJLİK KÛLTÛRÛ VE DENGBÛJLER
SEMPOZYUM BİLDİRİLERİ

SEMPOZYUM ONUR KURULU

Mehmet AKTAŞ
Şırnak Valisi

Mehmet YARKA
Şırnak Belediye Başkanı

Prof. Dr. Mehmet Emin ERKAN
Şırnak Üniversitesi Rektörü

Yılmaz ALTINDAĞ
DİKA Genel Sekreteri

Osman GELİŞ
Şırnak Ticaret ve Sanayi Odası Başkanı

SEMPOZYUM DÛZENLEME KURULU

Doç. Dr. İbrahim BAZ
Dr. Öğr. Üyesi Ruhullah ÖZ
Dr. Öğr. Üyesi Çağdaş ERTAŞ
Öğr. Görevlisi Susin GÖREN KEKEÇ
Öğr. Görevlisi Ayzıt GÖRÛCÛ
Öğr. Görevlisi Bedirhan ÖNEM
Arş. Gör. İsmet TUNÇ

SEKRETARYA

Cemile Cansel SARIŞAHİN
Tekin YILDIZ

BİLİM VE DANIŞMA KURULU

Prof. Dr. Abdulwahab Khalid MOSA	Zaho Üniversitesi (Irak)
Prof. Dr. Ali ERGUR	Galatasaray Üniversitesi (Türkiye)
Prof. Dr. Arzu ÖZTÜRKMEN	Boğaziçi Üniversitesi (Türkiye)
Prof. Dr. Christine ROBINS	Exeter Üniversitesi (İngiltere)
Prof. Dr. Eyüp ERDOĞAN	Mersin Üniversitesi (Türkiye)
Prof. Dr. Leyla NEYZİ	Sabancı Üniversitesi (Türkiye)
Prof. Dr. Meral ÖZBEK BOSTANCIOĞLU	Beykoz Üniversitesi (Türkiye)
Prof. Dr. Mustafa Muhtar KUTLU	Ankara Üniversitesi (Türkiye)
Prof. Dr. Serpil MÜRTEZAOĞLU	İstanbul Teknik Üniversitesi (Türkiye)
Doç. Dr. Yıldız DEVECİ BOZKUŞ	Ankara Yıldırım Beyazıt Üniversitesi (Türkiye)
Doç. Dr. Abdulsalam Najimaldeen ABDULLAH	Zaho Üniversitesi (Irak)
Doç. Dr. Emine UÇAR İLBUĞA	Akdeniz Üniversitesi (Türkiye)
Doç. Dr. Hussein Othman ABDULRAHMAN	Zaho Üniversitesi (Irak)
Doç. Dr. Kemal EROL	Yüzüncü Yıl Üniversitesi (Türkiye)
Doç. Dr. Metin YÜKSEL	Hacettepe Üniversitesi (Türkiye)
Doç. Dr. Rohat CEBE	Batman Üniversitesi (Türkiye)
Doç. Dr. Serhat HARMAN	Mardin Artuklu Üniversitesi (Türkiye)
Doç. Dr. Seyit Battal UÇURLU	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi (Türkiye)
Doç. Dr. Zahir ERTEKİN	Bingöl Üniversitesi (Türkiye)
Doç. Dr. Yavuz PEKMAN	İstanbul Üniversitesi (Türkiye)
Dr. Öğr. Üyesi Memet Metin BARLIK	Yüzüncü Yıl Üniversitesi (Türkiye)
Dr. Öğr. Üyesi Bayram KANCA	Giresun Üniversitesi (Türkiye)
Dr. Öğr. Üyesi Canser KARDAŞ	Muş Alparslan Üniversitesi (Türkiye)
Dr. Clemence SCALBERT-YUCEL	Exeter Üniversitesi (İngiltere)
Dr. Esmail SHAMS	Tahran Azad Üniversitesi (İran)
Dr. Öğr. Üyesi Mustafa ASLAN	Mardin Artuklu Üniversitesi (Türkiye)
Dr. Oles KULCHYNSKY	Bağımsız Araştırmacı (Ukrayna)
Dr. Saed Khudeida ALO	Duhok Üniversitesi (Irak)
Dr. Salar KUHZADY	Araştırmacı (İran)
Dr. Öğr. Üyesi Şakire BALIKÇI	Mardin Artuklu Üniversitesi (Türkiye)
Dr. Wendelmoet HAMELINK	Oslo Üniversitesi (Norveç)

İÇİNDEKİLER

XIII-XIV Sunuş

1 Açılış Konuşmaları

- 3-6 Doç. Dr. İbrahim Baz
(Düzenleme Kurulu Başkanı)
- 7-8 Osman Geliş
(Şırnak Ticaret ve Sanayi Odası Başkanı)
- 9-10 Yılmaz Altındağ
(Genel Sekreter / Dicle Kalkınma Ajansı)
- 11-12 Prof. Dr. Mehmet Emin Erkan
(Şırnak Üniversitesi Rektörü)
- 13-14 Mehmet Yarka
(Şırnak Belediye Başkanı)
- 15-16 Mehmet AKTAŞ
(Şırnak Valisi)

17 Açılış Konferansı

19-20 Moderatör

Vahdettin İnce

21-31 *Toplumsal Hafıza ve Dengbêjler*

Muhsin Kızılkaya

33-35 *Dengbêjliğin Farklı İnançlardan İnsanların Aşkını Dile Getirme Gücü:
Örnek Olarak, "Ermeni Gulê ve Musa Begê Xwêti" Kîlami ve Sunumu*

Memet Metin Barlık

37 Sempozyum Bildirileri

39-51 *Dengbêjlikte Tür ve Şekil Tasnifleri Üzerine Bir Değerlendirme*
Canser Kardaş

53-71 *Sözlü Gelenek Odağında Söz Ustası Dengbêjler ve Yakın-Uzak
Akrabaları*

Okan Alay

73-85 *Toplumsal Hafızanın Aktarıcısı Olarak Dengbêjler*

Ahmet Aktaş

87-103 *Dengbêjlik Kültüründe Sunum Farklılıkları: Serhat Bölgesi*

Memet Metin Barlık

- 105-119** *Ermeni Toplumunda Dengbêjlik Kültürü*
Yıldız Deveci Bozkuş
- 121-139** *Di Zargotina Kurdan De Erka Saziya Dengbêjiyê: Kürt Halk Edebiyatında Dengbêjlik Kurumunun İşlevi*
Cihat Güney, Kemal Erol
- 141-155** *Nağmelerin Kökeni Üzerine: 'Stran', 'Esâtir' ve 'Historia'*
Hamdullah Ercik
- 157-181** *Kürtlerde Önemli Bir Kültürel Bellek Aktarımı Olan Dengbêjlikte Aşk ve Erotizm Üzerine Bir İnceleme*
Serap Aksoy, Sedat Benek
- 183-211** *Sözlü Tarih Disiplininde Uygulanılması Gereken Metodoloji Nedir?*
Celal Öney
- 213-224** *Sözlü Kültür Epistemolojisi*
Abdulvasıf Eraslan
- 225-237** *Farklı Kavramlar Perspektifinden Sözlü Kültür*
Mustafa Yıldız
- 239-247** *Oral Traditions And Tourism*
Ahmed Zareer
- 249-260** *Somut Olmayan Kültürel Miras Olarak Dengbêjlik*
Çağdaş Ertaş
- 261-270** *Başlangıçta Söz Vardı: Sözlü Kültürün Dinsel Kaynaklardaki Yansımaları*
İsmet Tunç
- 271-286** *ادەنگەمەری یوزارەتە پەڕۆیەتی ناگەمەقەمەری زاوێش*
Pakhshan Sabir Hamad, Rézan Osman Mustafa
- 287-294** *Modern Şarkı Söyleme Teknikleri İçerisinde Dengbêjliğin Yeri*
Rohat Cebe
- 295-305** *Dengbêj û Dengbêjî*
Seyda Goyan
- 307-319** *İslam Tarihinin İlk Asrında Musiki*
Hüseyin Güneş

- 321-327 *Emevîler Döneminde Müzik*
Mustafa Özkan
- 329-349 *Taybetmendîyên Hunera Dengbêjîya Kurdî*
Mustafa Aslan
- 351-362 *Midyat ve Çevresinde Yaşayan Mhallemi Araplarına Ait Sözlü Kültür Öğeleri*
Yaşar Acat, Emin Cengiz
- 363-382 *Siirt Arapça Dialektinin Korunmasında Sözlü Kültürün Önemi*
Emin Cengiz, Yaşar Acat
- 383-395 *Dengbêjliğin Tarihi Süreç İçerisinde Ortaya Çıkışı ve Değişimi*
Bahattin Keleş
- 397-410 *Ermenistan Kürtleri Arasında Bilinen Köroğlu Destanı*
Mehmet Yılmaz
- 411-426 *Dengbêjî û Dengbêjên Culemêrgê*
Kerem Engin
- 427-441 *Cıhwar (Nav) û Hesta Aîdbûnê dî Kîlamên Dengbêjan de*
Ömer Delikaya
- 443-461 *Di Kîlamên Dengbêjan de Arketîpên Leheng, Dayîk, Peyamnêr û Hîlekar*
Sami Çeliktaş
- 463-499 *Hêmanên Osmanî di Dengbêjîyê da*
Ayhan Yıldız
- 501-515 *Dengbejlerin Türkülerinde Gayrimüslim Kız ile Müslüman Gencin Aşkı (Gayrimüslim Meyrem ile Aliye Kolağası Örneği)*
Nesim Sönmez
- 517-534 *بوعثتلا بدأ في مؤاشنتلا أشنم بارغلا*
Ahmad Said Al-Hussein
- 535-552 *Kültürel ve Dini Değerlerin Aktarımında Dengbêjlerin Rolü*
Muhammed Muhdi Gündüz
- 553-566 *Bir Anlatı Geleneği Olarak Dengbêjlik ve Eğitim Süreçleri*
Fırat Taş

- 567-604 *Berawirdiyek di Navbera Muşa'ereyên Edebiyata Klasîk û Lecên Dengbêjan de*
Abdurrahman Adak
- 605-631 *Du Deng Ê Yek Reng Dî Kurdî De: Dengbêjî Ê Qesîdebêjî (Ceribîna Berawirdeke Kurt)*
M. Zahir Ertekin
- 633-654 *Dinî Dengbêjlik: Qesîdebêjî ve Hafız Menduh'un Kasidelerinin İçerik Aşısından Kelamî Tahlili*
Ruhullah Öz
- 655-674 *Kürtçe Fıkraların Konuları Bakımından Sınıflandırılması*
İlyas Suvağci
- 675-683 *Kilameke Ku ji Tixûbê Semsûrê Derketîye: Bêmal*
Abdullah Koçal
- 685-696 *Awayê Vegotina "Got û Got" di Edebiyata Dengbêjîyê Dewek Mînak: Kilama "Feqî û Qîza Melle"*
Nevzat Eminoğlu
- 697-716 *Cureya Belîteyê dî Klamên Dengbêjîyê de*
Şehadet Sarıgül
- 717-735 *Di Wêjeya Dengbêjîyê de Ji Hêla Taybetiyên Cureyê ve "Dîlok"*
Ferda Bingöl
- 737-771 *Tîpolojîya Vegêrî ya Çîrvanokên Kurdî*
Kenan Subaşî
- 773-784 *Sebebên Nîfir û Gotinên Xîrab dî Kîlamên Dengbêjan da*
Şerif Güzel
- 785-795 *Kurdish Poem "Zembîlfirosh": From Early Modern Times to Nowadays*
Oles Kulchynskyy
- 797-814 *Di Edebiyata Devkî de Şer*
Ruhullah Öz, Şerefxan Cizîrî
- 815-822 *درکێ هافشد گنهر فاب اهنا دنوپی و اهماروا و تايولهف بهی هاگن*
İsmail Shams
- 823-831 *Lêanînên Hînnêbûyî di Kîlamên Dengbêj Mihemed Arifê izîrî de*
Ahmet Seyari

- 833-851** *Kekeme Bir Blbl: Kawis Axa*
Nihat Eren
- 853-871** *Zmar di Dengbjiy de: Dengbj Őakiro Wek Numne*
Nurettin Ertekin
- 873-888** *Myan Zazayan de Tradsyon Dengbj; Gorey Peyman Fonetk*
Analz Kilaman Rnber Ezz
Ahmet Krkan
- 889-905** *Di Nav Ekoln Dengbjiy da Cy Huseyn Far*
Ahmet Gem
- 907-930** *اغان سواک ى ناکەنار تەسکیتە ىر عەيشە ىز اوښد*
Hemin Omar Ahmad
- 931-953** *Ők Ruhst' nin Őiirlerinde İrfn Unsurlar*
İbrahim Baz
- 955-970** *Kadın Dengbj ve Őkların Eserlerine Mukayeseli Bir Yaklaşım*
Őakire Balıkı
- 971-984** *Literatrde Kadın Dengbjlerin Yeri ve Tartşılma Biimleri*
Dicle zcan Eli, Gazal Cengiz
- 985-1020** *Siirt ve evresinde Yaygın Olan Bazı Hikye ve Masallarda Yer Alan*
Dini ğeler
Adnan Memduhođlu
- 1021-1036** *Mardin ve Siirt Yresinde Kullanılan Arapa Ataszlerinde Kur'n*
Motifler
Ahmet Gl, Emin Cengiz
- 1037-1046** *Din ve Szl Kltr İliŐkisi Bađlamında Ataszlerin Hadislerdeki*
İzdşm
Mehmet Sait Uzundađ
- 1047-1063** *Ađıtın MeŐruiyeti*
Muammer Arangl
- 1065-1078** *Kltrel Bađlam erevesinde Szl Kltrn Hadislere Etkisi*
Nurullah Agitođlu
- 1079-1094** *Szl ve Yazılı Kltr Arasında Hadis Rivayeti*
Ahmet zdemir

DENGBEJ KILAMLARINDA YER(ADLARI) VE AITLIK DUYGUSU

Özet: Kürt sözlü kültürünün önemli temsilcileri sayılan dengbejer, toplumsal belleğin taşınması ve nesilden nesile aktararak korunmasında çok önemli roller üstlenmiştir. Dengbejlerin *kılam*ları ile oluşmuş sözlü kültür, tıpkı yazılı kültür gibi güçlü bir kültürel bellek ve sözlü tarihin yok olmasını engellediği gibi kendi öznelik ve mekansal arka planlarını da geleceğe taşımıştır.

Sözlü gelenek ile aktarılan çok yönlü halk anlatıları, mekan ve insan arasında kurulan güçlü bağları da ortaya çıkarması bakımından dikkate değerdir. Bu çalışma, dengbejlerin kılamlarında insan ve mekan ilişkisini; yer adları ve aitlik duygusunun ele alınma biçimini araştırmayı hedefler. Bu anlamda çeşitli anlatılarda, dengbejlerin coğrafya ile kurduğu bağ incelendi ve aitlik duygusunun hangi etkenler çerçevesinde oluştuğu ortaya kondu. *Kılam*larda yer adları kullanımlarının, anlatının hangi yönlerini güçlendirdiği ve mekansal belleğin aktarılma yollarına nasıl bir katkı sunduğu ortaya konuldu.

Anahtar Kelimeler: Dengbêj, yer adları, aitlik, mekan, bellek

PLACE(NAMES) AND SENSE OF BELONGING IN KILAMS (RECITATIVE BALLADS) OF DENGÊJ

Abstract: Dengbêjs, who are considered as important representatives of Kurdish oral culture, have played a very important role in protection and transmission of social memory from generation to generation. The verbal culture formed by the dengbejs not only prevented the extinction of a powerful cultural

* Doktora Öğrencisi, Muş Alparslan Üniversitesi, Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü, omerdelikayaa@gmail.com

memory and oral history, but also it carried its own subjectivity and spatial backgrounds into the future.

The multidimensional folk narratives conveyed by oral tradition are noteworthy in terms of revealing the strong ties established between space and human. This study aims to investigate the relationship between human and space in *kilams* of the dengbêjs with the help of placenames and the sense of belonging. In this sense, the connection between dengbêj and geography was examined in various narratives and it was revealed which factors were formed in the sense of belonging. It was explained how the use of placenames in *kilams* contributed to the ways in which the narrative strengthened and how it contributed to the ways of transmitting spatial memory.

Keywords: Dengbêj, place(name), sense of belonging, space, memory

Destpêk

Nûner û piştvanên çanda devkî dengbêj, di parastin û veguhastina bîra civatî de, bi erkên gelek muhim rabûye û xwedan cihêkî taybet e, di nav çanda devkî ya kurdî de. Di nav kurdan de, ji ber gelek sedemên cihê-cihê çanda nivîskî bi qasî ya devkî bingeh negirtiye. Nebûna çanda nivîskî ya temendirêj, qutbûnên siyasî-civakî ku li berdewamiya çanda nivîskî peyda bûne, ji hêlekê ve ji bo kurdî, rola vegêranên dengbêjiyê muhimtir kiriye û *hêza kelama* wan a ku bi xemlûxêza dîrok, serpêhatiyên biêş, qehremanî, bîra civakî ve bûye *kilam*, zêde kiriye.

Dengbêjan, bi deng û kilamên xwe ve bi sedan salan tevkarîyeke mezin ji bo bîra çandî ya kurdî kirine û guhê xwe dane ber hemû qewam û serpêhatiyên ku bo civata wan girîng in; ew bi zimanekî lihevhatî û nîmonîk ava kirine. Bi qewlê Ong, di çandeke ku nivîs lê pêşneketibe ango çanda devkî de ziman jî bo ku bi rihetî bê bibîrkirin bi rengêkî nîmonîk (*mnemonic*) û mewzûn/rîtmîk (*rhythmic*) tê derbirîn.¹ Meriv dikare bibêje ku çanda devkî ya kurdî, bi kilam û cureyên din ên folklorîk ve vê yekê piştrast dike. Rîtmîkbûna deng bi tevî wateyê û hin qalib û formên hazir ên vegotinê ku di kilaman de berçav in, bibîranîn, jiberkîrin û veguhastina wan hêsan dikan.

Ev xebat, li ser du xalan dabeş dibe. Beşa ewil dixwaze çarçoveyeke giştî ji bo serencama dengbêjiyê bide ligel hin guherîn û merhaleyên wê. Ev, guherînên sereke ên dîrokî-civakî li ber çavan digire bêtî ku desthilatdariyê

¹ Walter J. Ong, *Orality and Literacy*, Routledge, London & New York, 2002, r. 34.

jî piştguh bike. Beşa duyem jî bi rengêkî pir-rehendî dixwaze li ser mekan (*space*), cih (*place*) û hesta aîdiyêkê (*sense of belonging*) lêbikole di çarçoveya kîlamên kurdî de. Herwiha, ev nivîsar dîmena erdê kurdan a ku di kîlamên şer ên dengbêjiyê de bi sixletî derdikevin pêş çavê me, di pêwenda vebestîna cih û tîkiliya kurdan a bi erdê wan re dinirxîne.

1. Ji do heta îro: kurteserencama dengbêjiyê

Kevneşopiya dengbêjiyê heta kîjan demên kevnare diçe, an jî bi çi rengî xwe gihandiye dema me ya îroyîn zêde ne zelal e. Bermayî an jî delîlên kevnedîroka dengbêjiyê bi xwe dîsa kîlam û destanên wan in. Bi taybetî destana Memê Alan û Şahnameya Kurdî ku xwedan dîrokeke kevn in, bi rêya kevneşopiya dengbêjiyê xwe gihandine roja îro. Li gorî dahûrîn û lêkolînên zanistî ên li ser Şahnameya Kurdî ku dişibe Şahnameyên gelên din ên îranî, ew çavkaniya xwe ji deq û rîwayetên dinyaya îranî ya berî îslamiyetê digire.² Dêrînbûna dengbêjiyê jî bi çîroka destanî ya Şahnameyê re xwe digihîne demên kevn ên berî îslamê an jî dema nenasraw a ku tê de destan çêbûye.

Kîlam û destanên epîk, ji heyamên berê heta nîka bi destê dengbêjan hatine neqilkirin ango dengbêj di heman katê de *destanbêj* bûn. Hetta eger meriv bibêje ku dengbêjî bi kîlamên evîniyê zêdetir bi kîlamên epîk ên şer re qalib girtiye, dê ne xelet be. Kîlamên li ser şeran an jî kîlamên dîrokî, ji bo çend sedsalan hukmê vegêrana xwe qayîm kiribin jî piştî ku qewam û şerên nû bi awayekî rojane li bîra civakî zêde bûn kîlamên nû ketin dewsa wan ku dîroka gel a nêzîk re zêdetir tîkildar bûn. Di vê derbarê de, Gültekin dibêje ku gelek kîlamên ku di qeydên dîrokî de hatine qalkirin, negihîştine nîfşên nû û kîlamên nû dewsa wan girtine. Bi taybetî bûyerên gelek girîng ên ku li ser mîrên kurdan re derbas bûne, ku Şerefxanê Bedlîsî, Evliya Çelebi behs dikin û gelek lêkolînerên rojavayî ên wekî Therese Albertine Luise L. Robinson, (1840), Moritz Wagner (1840), Bodenstedt (1840) li Serhedê berhev kirine xwe negihandine heta roja me.³ Çawa ku tê dîtin, kîlamên li ser qewam û şeran ku di neqilkirina dîroka devkî de xwedan cihêkî muhim in, piştî wexteke ku herî zêde xwe digihîne çend sedsalan tîna jibîrkirin. Zêdebarî vê yekê, kilaman bi

² Shahab Vali, "Nêrîneke giştî ya li ser Şahnameya Fîrdewsî û Şahnameya Kurdî", *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Dîrok- Teorî- Rêbaz- Literatur Berawirdî-1* (Ed. Ramazan Pertev), İstanbul: Avesta, 2015, r.293.

³ Mehmet Gültekin, *Zargotîna Kurdên Serhedê: Kîlam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan*, Avesta, Stenbol, 2013, r.20.

berdewamiya qalibên vegêranê û meqamên muzîka xwe ve cureyên xwe parastibe jî naveroka vegêranê û qewama ku pêk tê piştî deman guheriye. Di dijberî bi kilamên şer re, ku bi domana sedsalan re eleqeya civakî bêpar dibin, qurma destanê ya sereke rûqalî guherîn û nûbûnan be jî eleqeya civakî ya li ser naveroka mîstîk û epîk a destanê dihêle ku ew xwe bi sedan salan bi neqilkirinê dengbêjan bête parastin.

2. Dewra Dîwanên Temirî û Bêpiştevaniyê

Di serdema mîrekiyên kurdan de cihê dengbêjan di nav civakê de muhim bû.⁴ Helbet, piştî ku dengbêjan ev piştevanî û hamîti winda kirin, dengên wan êdî “mîna qulîngan” ji dîwanan bilind nebûn.⁵ Alan, gotina “şairê rûyê dinê” ya Evdalê Zeynikê û gotina “ez dengbêj im” a Feqiyê Teyran di çarçoveya derbasdariya têgehên “şair” û “dengbêj” de dinirxîne.⁶ Herwiha ew, têkçûna mîrîtiyên kurdan ku rastî sedsala 19an tê, ji bo dengbêjiyê wekî mîlad qebûl dike; li gorî wî piştevanî û rûmeta dengbêjiyê dadikeve û dengbêjê ku serboriya mîran û cengan dikir *waqayîname*, bi kûrbûna karbeşiyê re dibe sazbandê dîlan û şahiyên ku pê re têkçûna epîkê jî rû dide.⁷ Bi rastî jî ev tespîten licih, piştî mîrekiyê rewşa ku dengbêj dikeve navê baş nîşan dide.

Rûmet û prestîja ku dengbêj lê xwedî bû, ji berê de, berçav bû ku helbestvanê klasîk Feqiyê Teyran derdiket digot: “ez dengbêj im”. Ev derbasdariya rihet ya di navbera herdu vegêrên (şair-dengbêj) ku xwedan du cureyên cuda ne (helbest-kilam), nîşan dide ku li ber çavên van hunermendan, wateya *dengbêj* û şair⁸ ne zêde dûrî hev in. Eger em dîsa vegerin li ser karbeşiyê, em dikarin bibêjin ku dengbêjê ku bi hunera xwe re mijûl bû, ji heqê karûbarên ji bo debarê bi serkeftî nikaribû bihata der.⁹ Li gorî Assman, di çandên cuda de ew kesên ku barê “veguhêzerên

⁴ Sedat Ulugana, “Tradîsyon û Duajoyên Evdalê Zeynikê”, *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Dîrok- Teorî- Rêbaz- Lîteratur Berawirdî-1* (Ed. Ramazan Pertev), Istanbul: Avesta, 2015. r.275-296.

⁵ Li vir divê meriv derî heta piştê negire. Lewra piştî têkçûna mîrekiyan jî gelek malbatên giregir ên ku xwedan derfet û dîwanên biçûk bûn li dengbêjan xwedî derketin. Li vir çêtir e ku meriv bibêje dengbêjan siwana desthilatdariyeke mezintir winda kirine, ne ku bi temamî piştevanî û rûmet.

⁶ Remezan Alan, “Dengbêj(î) û Helbesta Gelêrî”, *Wêje û Rexne*, hj. 4, 2015, r.10-11

⁷ Remezan Alan, *h.g.*, r.9-21

⁸ Pirseke ku li Elaşgirê min ji jinekê kir ev bû: “Evdalê Zeynikê kê ye?” Wê wiha bersiv da min: “Evdalê Zeynikê şairê dinê ye.” Li vir peyva “şair” mezinbûn, resenbûn, afirînerî û asta herî bilind a gotinê tîne ziman. Hê jî niştecihên Elaşgirê (dîwana Evdal li vê navçeyê bûye), wî wekî şair pênase dikin.

⁹ Surmeli Memed Paşa, wekî diyarî dixwaze gundê Bêdir ê li Elaşgirê bide Evdal, lêbelê Evdal vê

zanyariyê” dide li ser milê xwe, bi kar û berpirsiyariyên xwe yên rojane ra mijûl nabin:

“Veguhêzerên taybet ên bîra çandî her tim hebûn. Şaman, hozanên keltan ku jê re dibêjin bard, griot, rahip, mamoste, nivîskar, filozof, mandarîn û navê wan her çi bin, hemû kesên ku selahiyeta veguhastina zanyariyê ji bo wan hatiye dayîn, hemû daxilî vê komê ne. Hinartina wateyê ber bi derveyî teşeya rojane û parastina wateyê di bin baskê bîra çandî de, wisa kir ku kesên ku ji bo van karan hatibûn peywirdarkirin bi kar û berpirsiyariyên xwe yên rojane re eleqedar nebin. Li vir bîra meriv, bi karê “veguhêzerê zanyariyê” ve wekî pêş-teşeyê nivîsê tê bikaranîn.”¹⁰

Dengbêj di çarçoveya gotina Assman de, bi hunera xwe re mijûl bû û bi hunera xwe debara xwe jî dikir ji ber ku ew *veguhêzerên taybet ên bîra çandî* bûn. Rola hunera wan an jî veguhêzeriya wan, di dewsa nivîsandinê de kar dikir. Ji ber vê berpirsiyariyê, ew êdî bi karûbarên xwe yên rojane re eleqedar nebûn. Bi vî karî, em li karê dengbêjiyê veşerî, tê dîtî ku ev guherîna bingehîn a têkçûna mîrektiyên, ne tenê tesîr li “piştevanî”yê kir, lê di heman demê de, bi qewlê Alan, ew ji dîwanxaneyê daxist cihê dîlan û şahiyên û vê yekê jî bi xwe re *xerabûna epîkê* anî.¹¹ Piştî ku Evdalê Zeynikê mîrê xwe winda dike¹² ku piştevan û guhdarê kîlamên wî ye, êdî naxwaze here “dîwaneke temirî” ku berê dengê wî jê “*mîna qulinga, fena qazê*” bilind dibû. Bi mirina Surmeli Memed Paşa re, “dîwana belek” ya ku li Kela Elaşgirê¹³ ye, ditemire û Evdalê Zeynikê ku meşhurîrîng dengbêj e, van gotinan li ser vê yekê dibêje.

*“Ay de lo lo mîro, dilê min naxwaze îro şûn da here Kela Elaşgirê,
li daraxacê devê sazê. Ez dinêrim, dîwana Mirê min temiriye, dengê*

yekê qebûl nake, tenê axpîneke li binya gund hildide. Jixwe pêwistiya wî jî bi tişteki bi vî rengî tune ye. Binêre. Ahmed Aras, Şairê Kurda yê Efsanevî Evdalê Zeynikê, Weşanên Deng, Stenbol, 1996.

¹⁰ Jan Assman, *Kültürel Bellek*, (wer. Ayşe Tekin), Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2018, r.62-63

¹¹ Remezan Alan, *h.g.*, r.9-21

¹² Evdalê Zeynikê di şerê Xozanê (Kozan, Adana) de, mîrê xwe Surmeli Memed Paşa winda dike. Pey re dema ku vedigere Elaşgirê, kurê Surmeli Memed Paşa Evla Beg jî bi destê çerkezên tî kuştin li gundê Kelê. Evdal li ser herdu kesan jî kîlam gotiye; Kîlama Xozandaxê û Kîlama Evla Begê Mirê Zirav. Ev bûyer hê jî ji aliyê niştecihên Elaşgirê ve tîngî vegotin.

¹³ Kelê (bi tirkî *Toprakkale*), berê navenda navçeya Elaşgirê (bi tirkî, *Eleşkirt*) bû, lê nika gund e. Di kîlaman de gelek caran wekî “Kela Elaşgirê” tê binavkirin, ji bo ku bi gundên re tevlihev nebe ku navê wan jî Kelê ye. “Dîwana Belek” a Evdalê Zeynikê tê de dengbêjî kiriye, li vî gundî bûye.

*Evdal tê de nayê mîna qulinga, fena qazê.*¹⁴

Helbet, gelek dengbêj beriya Evdalê Zeynikê jî hebûne û mîr û paşayên kurdan re dengbêjî kirine. Ji wan ê herî binavûdeng, dengbêjê Qesra Îshaq Paşa, Dengbêj Çingo ye. Li gorî Gültekin ku bi Dengbêj Keremê Kor re hevpeyvîn kiriye, Dengbêj Çingo jî Îshaq Paşa û kurê wî Mehmûd Paşa re li Qesra Bazîdê dengbêjî kiriye, kurê wî Şerîfê Çingo jî ji Behlûl Paşa re dengbêjî kiriye.¹⁵ Ji vê mînakê tê fêmkirin ku carcar cihê ku şair û dengbêj lê hunera xwe pêşkêş kirine, ne dûrî hevdu ne. Herdu jî ji aliyê mîr/paşayên (desthilatdarê herêmî) ve tîn taltîfkirin û mîr tê pesinandin/rexnekirin. Herçiqas, em bi sedî sed bi belgeyên dîrokî ve nikaribin piştrast bikin jî, peywenda bi desthilatdarê û dîwanxaneyê re, şair-dengbêj rolên hunerî yên ne durî hev temsîl dikin. Ji bo ku mijar bêhtir berçav û dîtbar be, meriv dikare tabloyeke bi vî rengî li ser tîkiliya dengbêj-şairên kilasîk destnîşan bike.

Tablo1. Tîkiliya edebiyata nivîskî û devkî ya kurmançî					
edebiyata kilasîk a kurdî	mîr	Mîr Mihemedê Pirbelayî - Îshaq Paşayê II.	Îshaq Paşayê II. - Behlûl Paşa	mîr	edebiyata gelêrî ya kurdî
	şair	Ehmedê Xanî	Dengbêj Çingo - kurê wî Şerîfê Çingo ¹⁶	dengbêj	
	mêjû	(sedsala 17-18an)	(dawiya sed-sala 18an-nîvê yekem ê 19an)	mêjû	
	mesnewî	Mem û Zîn	Memê Alan ¹⁷	destan	
	çih	Qesra Îshaq Paşa (Qesra Behlûl Paşa)		çih	

¹⁴ Ji kilameke dengbêjêkî ku 59 deqîqeyan, serboriya Surmeli Memed Paşa, çûna wî ya şer, vegera wî û hwd. dibêje. Navê dengbêj nehate tespîtkirin. Ji arşîva min a taybet.

¹⁵ Mehmet Gültekin, *Zargotîna Kurdên Serhedê: Kîlam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan*, Avesta, Stenbol, 2013, r.20.

¹⁶ Li gorî hevpeyvîna Mehmet Gültekin ku li Bazîdê bi dengbêjê navdar Keremê Kor re kiriye û li gorî çend çavkaniyên ku bi xebata xwe ya sehayî ve bi dest xistiye, endamên malbata Çingo demeke dirêj li Bazîdê bi taybetî jî li Qesra Îshaq Paşa dengbêjî kirine. Bo zêdetir agahiyên û vegêranên gotinbêjan, bnr. Mehmet Gültekin, *Zargotîna Kurdên Serhedê: Kîlam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan*, Avesta, Stenbol, 2013, r.20

¹⁷ Ji kevin da tê zanîn ku destana Memê Alan ku carinan li Serhedê wekî Memoyê Alan jî tê binavkirin,

Piştî ku Ahmed Aras li ser Evdalê Zeynikê xebatake sehayî kir, bi nevî û malbata wî re xeber da û ew bi raya giştî re da nasîn, zanyariyên herî pêbawer ên di derbarê Evdal de hatin belavkirin.¹⁸ Bi saya serê pirtûka bi navê *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* (1991) ya Mehmed Uzun, eleqeya di derbarê Evdal de zêde bû. Di vê derbarê de, Scalbert-Yücel amaje pê dike ku xebatên Mehmed Uzun (1953-2007) ku nivîskarekî girîng ên kurdî ye, roleke navendî lîstiyê di îmaj û pozisyona heyî ya dengbêjiyê de. Bi taybetî xebatên xwe yên wekî *Rojek ji Rojên Evdalê* (1991), *Hawara Dîcleyê* (2001), *Dengbêjlerim* (1998) Uzun dengbêjî bi rengekî ji nû ve avakir û hin ji wan wekî figûrên neteweyî derxist pêş.¹⁹

Hewldanên ku ji aliyê Mehmed Uzun ve hatin kirin, ji bo danasîna dengbêjiyê girîng bû, lewra dengbêjên ku ji ber dormaleya siyasî ya hişk “rewac” a xwe winda kiribûn di nav kurdan de ji nû ve bûn xwedan qîmet. Ev hewldan fêhm û têgihiştina derbarê dengbêjiyê de xurt kir û ew ji “tawanbarî”yekê xelas kir. Li gorî gotina Hamelink ku tê de amaje bi vê tawanbariyê dibe, li ber çavên “çalakvanên siyasî” dengbêjan “rêya rast nehilbijartibûn”, ew ne xwedî “hişmendiya neteweyî” bûn.²⁰ Ev “tawanbarkirin” helbet di qada berçav a çalakvanên siyasî de derdiket holê, piyaseya firotina qasêtên dengbêjan di salên nodî de jî li gelek bajaran li kar bû. Qasetên dengbêjan²¹ bere bere di nav civakê de belav bûn, bi vî rengî kilaman, serê berîn bi dizî û pey re jî li navendên bajar û navçeyan bi dengên bilind, xwe gihand girseyeke mezintir.

li herêma Serhedê destaneke berbelav e. Di sala 1904an de, keşîşê ermenî G. Nzhdehian, ji salixdarekî ku navê wî nayê zanîn li Elaşgirê Mem û Zînê bi kurmancî berhev dike û werdigerîne ermenkî, binêre: Chyet, Michael L., *And a Thornbush Sprang Up between Them: Studies on 'Mem u Zin', a Kurdish Romance*, Ph.D. Dissertation, University of California at Berkeley, 1991, r.335; Dîsa Dengbêj Kazoyê Garisya ku xaleke girîng a peyrevên Evdalê Zeynikê pêk tîne, li Elaşgirê Memoyê Alan bi dengbêjî gotiye. Ev nimûne, nişan didin ku ev destan ji berê de bi dengbêjan hatiye gotin û bi egereke mezin Ehmedê Xanî ev destan ji dengbêjên vê herêmê wergirt û mesnewiya xwe li ser îskeleta wê ava kir.

¹⁸ Herçiqas pirtûka wî dereng hatibe weşandin jî hevpeyvînen wî xwe digihînin çend dehsalên beriya çapa pirtûkê, binêre: Ahmed Aras, Şairê Kurda yê Efsanevî Evdalê Zeynikê, Weşanên Deng, Stenbol, 1996.

¹⁹ Clémence Scalbert-Yücel, “The Invention of a Tradition: Diyarbakır’s Dengbêj Project.” *European Journal of Turkish Studies*, 10, 2009: <http://ejts.revues.org/4055> (xwe gihandin:1 Nîsan 2019).

²⁰ Wendelmoet Hamelink, Hanifi Barış, “Dengbêj di Sînoran de: Sînor û Dewlet bi Nêrîna Kîlam-bêjên Kurd”, (wer.Şehmuz Kurt & Ziyaeddin Yıldırımçakar), *Wêje û Rexne*, hj.3, 2014, rr.173-200

²¹ Ji bo rola kasetên dengbêjan û arşivkirina wan bi tevî nirxandineke pîr-rehendî û berfireh, li xebata Scrafer binêre: Marlene Schäfers, “Archived Voices, Acoustic Traces, and the Reverberations of Kurdish History in Modern Turkey”, *Comparative Studies in Society and History*, 61 (2), 2019, r. 447-473

Piştî, dengbêjî wekî qadeke akademîk derket rojeva lêkolîneran û piştî ku nivîskarên kurd ên li Ewropayê eleqeyê berçav nîşan dan li ser dengbêjiyê, fêma û têgihiştina derbarê dengbêjiyê de ber bi başiyê guherî. Bi taybetî bi salên 1990î û salên 2000î, ji dengbêjiyê ra di *dîwanên* xwe yên adetî de nebe jî ji xwe ra qadeke civakî ya nû(jen) de ku ji raya giştî zêdetir eleqe peyda kirin: *Malên Dengbêjan*. Scalbert-Yücel, Malên Dengbêjan wekî “hewlên nefermî û binîqaş bo sazûmankirina (*institutionalisation*) kevneşopiya kurdî ya Tirkiyeyê” pênase dike.²² Malên Dengbêjan di nav civatê de fêma û têgihiştina derbarê dengbêjiyê de gelek guhert, rûmet û eleqeya berê zindî kir. Her ku çû, dengbêjî zêdetir di cîhana dîjîtal de dîtbar bû, bo wan televîzyonên fermî-nefermî de bernameyên taybet hatin amadekirin û gelek dengbêjên nenas ku di civateke berteng de dihatine nasîn bûn xwedî navekî meşhûr. Herwiha zext û “bêdengkirin”ên ku ji aliyê çalakvanên kurdan ve li dengbêjî û hunera wan dihate kirin cihê xwe bo “vedîtin” û “jinûvekişfkirin”ekê hişt.

3. Erdê Bi Kilaman Neqîşandî: Cih û Cihnav (*Placename*) û Vebestîna Bi Erdê Re

Dengbêj, bi hafizeya xwe ya xurt ve nêznasê civaka xwe ye; ew kevneşopî, erf û adet, rabûn-rûniştin û erdnîgariya lokal û giregir û malbatên sereke ên civaka xwe baş dinasin, bi hemû layenan ve agahiyên wan derbarê civatê û bûyerên girîng ên civakî, çîrok û destanan de heyê. Taybetmendiyê gelek balkêş a dengbêjiyê jî ew e ku dengbêj di neqîlkirina bûyerê de îşaret û nîşanên erdnîgariya xwe bi serkeftî bi kar tînin; ew hem nexşeya lokal a nêzîkî xwe, bi tevî gund û navê gund, newal û kendalan baş dizane, hem jî dema ku bûyereke diqewime, wê di bîra civakî de bi tevî cihê ku bûyer lê qewimiye di derbirîna xwe de bi serfirazî bi cih dike. Ev bikaranîna navê erd û gundan û cihên girîng ên bûyeran wisa muhim in ku carinan bi dehan cih tenê di nav vegêrana kilameke li ser bûyereke civakî tê gotin. Meriv dikare bibêje ku ev hêla kilamên dengbêjan bi têra xwe bal nekişandiye ser xwe û bi renekî xweşik nehatiye zelalkirin.

Hamelink ku xebateke berfireh li ser Mala Dengbêjan kiriye, wihareng behsa bikaranîna navên cihan dike:

²² Clémence Scalbert-Yücel, b.n., r.

“Bi rêya, bi berdewamî behskirina navê cihûwaran û îşaretên fîzîkî li dîmenekê di dema performansê de, dengbêj nexşeya herêma kurdî xêz dike. Ev nexşekirin, dibe ku ji bo guhdarên berê wekî noqteya referansê kar kiribe, wekî ku kilam dikare kesekî bi wêneyê mezintir yê dorhêla wî/wê ya jîyanê bide warqilîn. Ev di heman katê de nîşan dide ku dorhêla herêmî di nav rastiya xwe de tê hesîn, bêyî ku referansên rasterast bide dewlet û sîstemên polîtîk ên mezintir ku pê re girêdayî ye.”²³

Yüksel, xwezaya dij-vegêran ya di çarçoveya gotara dîrokî de dide ber çavan û dibêje performansê dengbêj xeyaleke nexşeyî ya xwemalî nîşan dide. Bo nimûne Anadolû, wekî cihekî cografîk ku zêde tê qalkirin ku kesek lê tê sirgûnkirin.²⁴ Gelek dengbêj di kilamên li ser şeran de *xeyaleke nexşeyî* ya xurt pêşkêş dikin ji bo civata xwe. Ev taybetmendiyê sereke ya kilamên şer e. Di kilamên evînî de navê cihên ku derbas dibe, zêdetir bi xwezaya xweşik û pastoral a wî cihî re têkildar e; Çiyayên Şerefdînê, Kosedax, Milazgira jêrîn, Zozanên Serhedê û hwd.

“Her civat xwedî dîtina xwe ya cografîk e û ev yek ji bergeha xwe ve, bo fêmkirina dinyayê bingehîn e” dibêje O’Shea û wiha pê de diçe: “Kurd hem bi cihê xwe yê jidayîkbûnê ê rastîn ve hem jî gelemperî bi têgeha Kurdistanê re bi rengekî qayîm vebestî ne.”²⁵ Ev vebestîna a bi Kurdistanê re di vegêrana folklorîk ya kilaman de –ku herî zêde navê cihûwaran di wan de derbas dibin- dernakeve holê. Nexşeya ku di kilaman de derdikeve holê, wekî ku Hamelink jî anî ziman bi piranî bi *dorhêla herêmî* re girêdayî ye. Li gorî Hamelink navenda *dîmena xeyalî* ya kilaman li dor serpêhatiya sosyo-polîtîk ya kurdî ava bûye, navendên Împeratoriya Osmanî û Tirkiyeyê di kilaman de wekî cihên muhim xuya nakin û herwiha ev erdnîgariya kurdî wekî hebûneke sosyo-polîtîk şeklê Kurdistaneke mezintir jî nagirin ku wê bi rastiya guhdaran re jî li hev neyê.²⁶ Amy de la Bretèque, di xebata xwe de ku li ser kilam û zêmarên kurdên êzidî ên li Ermenistanê kiriye, kilamên ku di merasîmên cenazeyan an jî xeberdanên rojane de wekî axaftineke

²³ Wendelmoet Hamelink, *The Sung Home: Narrative, Morality, and the Kurdish Nation*, Unpublished PhD Thesis, Leiden University, 2014, r.132-133.

²⁴ Yüksel Metin, *Dengbêj, Mullah, Intelligentsia: The Survival and Revival of the Kurdish Kurmanji Language in the Middle East, 1925-1960*, Unpublished PhD Thesis, University of Chicago, 2011, r.105.

²⁵ Maria T. O’Shea, *Trapped between the Map and Reality. Geography and Perceptions of Kurdistan*. Routledge, New York and London, 2004.

²⁶ Wendelmoet Hamelink, *b.n.*, r.132-133

melodîkirî (*melodized speech*) tèn gotin wekî *kilamên ser* bi nav dike û wiha pê de diçe “topografya ne qadeke erdnîgarî te’rîf dike, lêbelê bêtir bi awayekî eşkere cîhanê dike du beş ji aliyê qadan ve: Ewên malbatî/gundî û ewên mişextî.”²⁷

Kilam di devê dengbêjan de ew vegêran e ku cihên bîrê ava dikin. Carcar, eger dengbêj bi şervanan re be an jî kesê şahid re be, wê demê yekî pir nêzîkî bûyerê dixwaze bi kitekit hîn bibe û hemû nexşerêya bûyerê derxe meydanê.

Cih ew war e ku xwediyê wateyekê ye. Ew war, ku ber bi binavbûnê dirûv digire di hafizeya me de gava berîn wekî destnîşankirina “binavkirina erdî” derdikeve tebeke watedarbûnê. Bi gotina Frake, “cihê ku tê binavkirin dibe war”.²⁸ Ango binavkirin, merhaleyê girîng e ji bo cihê bibe war. Ev binavkirin, binasyarkirin, biwarkirin û hezkirin e. Bi vê rêyê ve dikeve nav vegêranên devkî û nivîskî, bi vî rengî di nexşeya hişê me de cihê wê yê referansê çêdibe. Hebûna wê pê nasyar dibe, ewilî bi navê wê ve qayîm dibe û peyre bi domana demê re bûyerên ku lê pêk tê, nasnameyê bi erdê re çêdike. Ev nasname, ev reseniya erdekî diyar piştî deman dibe warekî ku mirov pê re dikeve nav danûstandineke hestî. Ango vebestîna bi erdê re (*place attachment*) û nasnameya erdî (*place identity*) derdikeve mexderê. Çawa ku Lewicka tîne ziman dema ku kesek bi cihê re tete girêdan, zêdetir eleqeya xwe tîne ziman di derheqê rabirdûya wê cihî de û derheqê kokên xwe de ji wan kesan zêdetir yên ku kêr eleqeyê nîşan didin.²⁹ Ango kilam wekî alavekî kar dikin, alava ku guhdaran bi erd û rabirdûya wan re girê dide, xeyala welatê wan di serê wan de zindî dihêle. Vebestîna cih (*place attachment*) têgeheke girîng e ku ji bo têtîliya meriv-cih pê eşkere bibe. Bîr an jî bîra hevpar, ji ber ku xwediyê rola avakirina fêhmeke nasnameyê ye, jidestçûna wê tesîrê li nasnameyê dike.

Bîra hevpar nasnameyê pêk tîne, bi taybetî bîranînên bûyerên ku bo civakê wateyê wan a muhim heye, di avakirina vê nasnameyê de çalak in. Ev vebestîn, bi demê re ku hesta cihî li meriv peyda dikin di derdora civakî de jî nasnameyê bi xwe re tîne.

²⁷ Estelle Amy de la Bretèque, “Awazên (Dengên) Keserê: Axaftinên Melodîkirî, Zêmar û Vegotinên Lehengî di Nav Êzidiyên Ermenistanê de”, (wer.Sinan Gültekin), *Wêje û Rexne*, hj.9-10, 2018, r.67.

²⁸ Neqilkirin: S. Elizabeth Bird, “It Makes Sense to Us: Cultural Identity in Local Legends of Places”, *Journal of Contemporary Ethnography*, 31, no.5, 2002, r.520.

²⁹ Maria Lewicka, “Place attachment, place identity, and place memory: Restoring the forgotten city past” *Journal of Environmental Psychology*, 28 (3) (2008), pp. 210.

Dengbêj bi kilaman ve, êş kedera kesekî din tîne ziman û bûyer/qewamên trajîk neqil dike û ji wan re şahidiyê dike. Karesat an jî qetlîamên ku rûdaye û ji aliyê civakê ve êşa wê hatiye/tê kişandin, carcar dibin babetên sereke. Bi rêya veguhastinê dengbêj li guhdaran dide zanîn; bi wan re şahidiya ku bi dest xistiye parve dike. Herwiha, ev şahidî bi alîkariya cih/erdê pêk tê. Wekî ku bi dil bike şahidiya çiya û baniya, gund û deveran wekî delîl nîşan bide, ew bi baldarî nav û nasnameya cih/war tîne ziman; êş û trajediya pêkhatî bi erdê re vedibestîne ku bûyer lê qewimiye. Ev yek, bûyera dilêş û cimaetê tîne rûyê hevdu; bi ser de jî cih û waran jî jê re dike şahid û palpişt da ku bi rêya wan trajediya ku tê tecrûbekirin mohra xwe ne tenê li hafizyê lê herwiha li erdê jî bixe.

Gelek kilamên ku ji bo vê xebatê hatin ketin ber çavdêriyê ku bi gelemperî kilamên şer bûn, di pirtûka bi navê *Zargotina Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan* ya Mehmet Gültekin de cih digirin. Di pirtûka navborî de 110 kilamên şer, mêrxasî û serhildanan cih digirin, çend kilamên ku qismek ji wan li ser mezinên dîni ne tê de, di hemûyan de navê cihûwaran (*placename*) derbas dibe. Ango di pirtûkê de, bi sedan navên gundan û cihê bûyeran derbas dibin. Lêbelê ya ku di kilamên şer de balê dikişîne ew e ku dengbêj bi gelemperî heta navê gund an jî herêma ku bûyer lê qewimiye nebêje, dest bi vegêrana xwe nake. Dengbêj bi piranî di destpêka kilama xwe de navê cih û war tîne ziman ku qewam lê pêk hatiye. Eger em bo vê yekê çend nimûneyan bidin dê mebestê zelaltir be. Ev nimûneyên li jêr tenê ji destpêka kilamê hatiye wergirtin, eger dirêj be beşa lorandinê nehatiye hildan û di nav kevanekê de navê kilamê hatiye nivîsandin:

“Were hay delal, hay delal, hay delal, bê tu delalî

Axawo bihar e, şerek li me qewimiye li Gamêşvanê li Panosê berî li avê”
(Kor Husêyn Paşa)³⁰

“Elîko lo lawê, şerekê li me çêbû li Gera Sîmo,

li Marsêlê, li Marsedaxê lo bi ta-heze.”(Elîko lo Lawo)³¹

“Eman Fato digo, lê-lê Qudo rebenê, li dîharê

Gonigê diketim, îro ji Vartoyê berjêr wê da Xêrgîse

³⁰ Mehmet Gültekin, *b.n.*, r.252

³¹ Gültekin, *h.b.*, r.260

Cawek ji min re hatiye, Xalid Begê Cibriya yekî xweş reîse” (Xalid Begê Cibirî)³²

*“Wayê mîrêm sibe ye, şerekî li me çênebûya li
Şêrwanşêxanê, li Qanîka, îro li Bendê Xaçê” (Xalid Begê Hesenî)³³*

*“Fîlîto lawo, karwanî, berxê min lawo, karwanî
Karwan êvarê bar kir, sibê bi royê ra qe dananî
Ji Kevanê Kêrê, Kaniya Qîrê, Pira Batmanê,
li Delavê Paşo pêşî vegeriye ser paşiyê danî” (Fîlîtê Quto)³⁴*

*“Li şêherê Diyarbekira şewitî diketim dilê min û
te ra vê sibengê tu dêna xwe bidê cote
qumandanê dewletê li derê Êskanê mişêwre dikirin” (Bavê Şemsedîn)³⁵*

*“Dîdarê band dikire Beso û Bêlo, rebenê xwengê
rabe sêyr bike mîla serê şeweqê li Qazgolê li Melê da” (Seyidxan)³⁶*

Wekî ku ji mînakan jî tê dîtin, berî ku dengbêj behsa bûyerê bike ku li lehengan qewimiye, nexşeyekê dixwaze çêke di serê guhdar de û bûyerê li ser cihêkî bi cih dike. Ev nexşeya ku tê çêkirin bi tevî bûyer û serpêhatiyan di avakirina bîreke hevpar de pêşengiyê dike. Bi qewlê Halbwash, “tu bîreke hevpar tune ye ku di çarçoveyê mekanî de bi cih nebe”.³⁷ Bîra ku bi kilamên dengbêjan ve tê avakirin û veguhastin di çarçoveyê mekanî de bi pêş dikeve; dengbêj navên cihan di kilamên xwe de tînin ziman wekî bixwazin li ser nexşeyê jî cihê bûyerê destnîşan bikin û şahidiya cih jî vegêrana xwe re bikin palpişt. Bi dehan referans/işaretên navan ku di veguhastina qewamê de tînin derbirîn, xêncî çêkirina dîmeneke xeyalî ya cihê bûyerê, hesteke aidiyetê jî bi dengbêj û guhdar re çêdike. Ev aidiyet, bi nêrîneke modern ve ne aidiyeteke welat-neteweyê ye lêbelê aidiyeteke lokal e. Herwiha guhdar an jî cemaet bi rêya îşaretên bi cih û waran, bi erdnîgariya xwe re tîkiliya xwe ya hestî xurt dike. Wekî ku Bird berpêş dike “bi rêya çîrokên di derbarê cih de, em sînorên xwe yên mekanî xêz

³² Gültekin, *h.b.*, r.267

³³ Gültekin, *h.b.*, r.289

³⁴ Gültekin, *h.b.*, r.163

³⁵ Gültekin, *h.b.*, r.290

³⁶ Gültekin, *h.b.*, r.296

³⁷ Maurice Halbwasch, *Kollektif Hafıza*, Çev. Banu Barış, Heretik, Ankara, 2017, r.153.

dikin”³⁸ Di qewamên trajîk de navê cih dibe nîşankereke biwate ya ku balê dikişîne li ser “cihê bîrê” (*place of memory*). Qewamên civakî ku bi gelemperî dengbêj wan di kilamên şer de vedibêjin “xwe” di çarçoveya dîrokî-civakî de, bi cih dike û hest bi rêya erd derdikeve holê.

Hin kilamên taybet jî hene ku tê de leheng li revê ye û hin kes li şopa wî digerin. Di kilamên bi vî rengî de hemû gund, newal û kendalên ku leheng jê derbas dibe bi yeko yeko tê ziman. Ji vê cureyê re kilamên meşhur yên “De Xalo” û “Elî Xarza” de, dibe nimûneyeke baş. Ev kilam, yek bi devê xal, yek jî bi devê xwarza ve hatine gotin. Kilama bi navê Elî Xarza ku bi devê xalê wî tê gotin kuştina Eliyê Xarza bi awayekî gelek diltezîn dibêje. Guhertoya kilamê ya ku bi devê Elî Xarza tê gotin ku bi Kawîs Axa re meşhur bû û pey re bi Şivan Perwer re ev kilam bû yek ji wan kilamên herî meşhur ya kurmançî. Di kilamê de ji Bazîdê heta Erzîrumê hemû gund û deverên ku leheng tê re derbas dibin bi libo libo tê qalkirin. Di kilama Elî Xarza³⁹ de, bi tevî dubarekirina hin navan bi ser hev du 160 heb nav derbas dibin. Kilam gelek bi detay qala nexşerêya lehengan dike heta kuştina wî ya li ber dara şîlanê.

Encam

Bi deng û kilamên xwe ve dengbêjan, bi sedan salan tevkariyeke mezin bo bîra çandî ya kurdî kirine û guhê xwe dane ber hemû qewamên ku bo civata wan girîng in. Kilamên dengbêjan li gel hunera xwe ya xurt ya lihevhatî, gelek hêlên xwe yên din ve jî balê dikişîne li ser xwe ku yek ji wan jî awayê bikaranîna navê cih û waran e. Dengbêj bi kilamên xwe ve hesta aidiyekê ya bi erdê wan re di nav civakê de xurt dike. Êş û trajediya pêkhatî bi erdê re vedibestînin ku bûyer lê qewimiye. Ev yeka bûyera dilêş û cimaetê tîne rûyê hevdu; bi ser de jî cih û waran jî jê re dike şahid û palpişt da ku bi rêya wan trajediya ku tê tecrûbekirin mohra xwe li erdê xe. Dengbêj wekî ku bixwaze vê yekê zaf berçav bike, bi piranî di destpêka kilama xwe de navê cih û warê ku qewam pêk hatiye bîne ziman. Ew di heman demê de, bi rêya destnîşankirin û nexşekirina sînorên mekanî hesta aidiyeteke lokal ava dikin û pevgirêdana civatê ya bi erd û cografyaya wê re xurt dikin.

³⁸ Bird, S. Elizabeth, “It Makes Sense to Us: Cultural Identity in Local Legends of Places”, *Journal of Contemporary Ethnography*, 31, no.5, 2002, r.523.

³⁹ Gültekin, *h.b.*, r.214-216

Dengbêjî bi hemû hêlên xwe ve hêjayî gelek lêkolînan e. Bikaranîna navê cihan û hesta aidiyetê jî di vê çarçoveyê de vegêranên folklorîk ên dengbêjiyê de derdikevin holê. Dengbêj hem erdê xwe gelek baş nas dike, hem jî wê bi guhdarên xwe dide nasîn. Ew sînore civaka xwe xêz dike bi rêya dîmena xeyalî ya ku bo guhdarên xwe pêşkêş dike.

Çavkanî

- Ahmed Aras, Şairê Kurda yê Efsanevî Evdalê Zeynikê, Weşanên Deng, Stenbol, 1996.
- Alan, Remezan, “Dengbêj(î) û Helbesta Gelêrî”, *Wêje û Rexne*, hj. 4, 2015, rr.9-21.
- Bird, S. Elizabeth, “It Makes Sense to Us: Cultural Identity in Local Legends of Places”, *Journal of Contemporary Ethnography*, 31, no.5, 2002.
- Chyet, Michael L., *And a Thornbush Sprang Up between Them: Studies on ‘Mem u Zin’, a Kurdish Romance*, Ph.D. Dissertation, University of California at Berkeley, 1991
- Halbwachs, Maurice, *Kollektif Hafıza*, (Çev. Banu Barış), Heretik, Ankara, 2017.
- Hamelink, Wendelmoet, *The Sung Home: Narrative, Morality, and the Kurdish Nation*, Unpublished PhD Thesis, Leiden University, 2014.
- Hamelink, Wendelmoet & Barış, Hanifi, “Dengbêj di Sinoran de: Sinor û Dewlet Bi Nêrîna Kilambêjên Kurd”, (wer. Şehmuz Kurt & Ziyaddin Yıldırımçakar), *Wêje û Rexne*, 3, 2014, r.173-200
- Lewicka, Maria, “Place attachment, place identity, and place memory: Restoring the forgotten city past” *Journal of Environmental Psychology*, 28 (3) (2008), pp. 209-231.
- Mehmet Gültekin, *Zargotina Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan*, Avesta, Stenbol, 2013.
- Sedat Ulugana, “Tradîsyon û Duajoyên Evdalê Zeynikê”, *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Dîrok- Teorî- Rêbaz- LîteraturBerawirdî-1* (Ed. Ramazan Pertev), Avesta, İstanbul, 2015. r. 275-296.
- Jan Assman, *Kùltürel Bellek*, Çev. Ayşe Tekin, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2018
- Ong, Walter J., *Orality and Literacy*, Routledge, London & New York, 2002.

- O'Shea, M., *Trapped between the Map and Reality. Geography and Perceptions of Kurdistan*, Routledge, New York and London, 2004.
- Shahab Vali, "Nêrîneke giştî ya li ser Şahnameya Fîrdewsî û Şahnameya Kurdî", *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Dîrok- Teorî- Rêbaz- LîteraturBerawirdî-1* (Ed. Ramazan Pertev), İstanbul: Avesta, 2015. rr. 275-296.
- Scalbert-Yücel, Clémence, "The Invention of a Tradition: Diyarbakır's Dengbêj Project." In *European Journal of Turkish Studies* 10, 2009. <http://ejts.revues.org/index4055.html> (xwe gihandin:1 Nîsan 2019).
- Schäfers, Marlene, "Archived Voices, Acoustic Traces, and the Reverberations of Kurdish History in Modern Turkey", *Comparative Studies in Society and History*, 61 (2), 2019, r. 447-473
- Yüksel Metin, *Dengbêj, Mullah, Intelligentsia: The Survival and Revival of the Kurdish Kurmanji Language in the Middle East, 1925-1960*. Unpublished PhD Thesis, University of Chicago, 2011.
- Amy de la Bretèque, Estelle, "Awazên (Dengên) Keserê: Axaftinên Melodîkirî, Zêmar û Vegotinên Lehengî di Nav Êzidiyên Ermenistanê de", (wer.Sinan Gültekin), *Wêje û Rexne*, hj.9-10, 2018, r.67.